





### "App" a nuh ji bo qeydkirina şemaya zaroka ya Tieto Education (Lifecare)

Beledîyeya Borlänge 3 yê heyva duwanzdehan (3/12) wê qeydkirina ji bo şemaya zarokan bi awayekî din tetbîq biki. Appek ku di App Store û Google play de heye, wê têkevê şûnda çareserîya (metod) web ê ya nuha. Navê app ê Tieto Edu ye.


Kesên ku îmkana wan ya bikarnîna telefona mobîl yan jî iPad ê tunebin, dikarin şemayê di komputerê (dator) de qeyd bikin. Lê vêca îmkana bibîrxistinên otomatîkî ji dest mirov diçe (mirov nikare jê îstîfade bike).

Ev şema her hefte di app ê de tê qeydkirin û ev kari bê kopîyekirin û ji bona hefteyeke din jî bê qeydkirin. Mirov dikari hilibijêri bê ji bo kîjan hefteyan wê ev şema bê kopîyekirin.





Heger welîyên zarokê li adresên (navnîşan) cuda de bijîn, gava zarok li ba wana bin karin wektên xwe di wir de binivîsin û karin li şemaya yê din jî binerin.



Îmkan heye ku mirov di app ê de ji bo 20 hefteyan şemayê çêke. 28 rojan berî xelasbûna şemayê agahdarî(mesaj) ji VH re tê şandin, paşê, 14, 7, 3, 2, 1 rojan berî ku mirov şemayekê çêbike mesajê tê şandin.

Ger şemaya mirov baş meşîya hewce nake ku mirov carekî din di app ê de şemayê çêke, lê şemaya ku mirov li ser biryar daye wê li wir bimîne heta ku mirov wêna biguhere.